

SÎSTEMA OCAX, QEBÎL Û EŞÎRÊN ÊZDIYAN: TÊRMÎNOLOJIYA WAN (*Ligel lîsteya ocax û qebîlên şêx, pîr û mirîdên êzdiyan*)

Nivîskar: **XANNA OMERXALÎ**
Wergera ji Ingilîzî: **ERGÎN OPENGÎN**

r. 33

DESTPÊK

Êzdiyatî ku di lîteratura giştî de wekî “*Yezidism*” an jî “*Yazidism*” tê nasîn, yek ji qedîmtirîn dînên kurdan ên yekxwedayî ye. Êzdiyatî ku yek ji wan dînên herî sirdar ên Rojhilatê ye, xwedî taybetiyên bingehîn ên dînên naskirî ye, mn. dogma, teolojî, merasîmên dînî, ayîn û merasîmên têkel û hiyerarşiya ruhanîvan. Êzdiyatî, herwiha cudayî û pakiya kastan (çînên civakî) jî diparêze ku di rastiya xwe de ew bingehên civaka dînî ya êzdiyan e.

Civakên dînî û neteweyî, ku dûr û veder in ji kartêkirinên dînî û kulturî û herwiha ji ber bêhtir xwedî tradîsyonên devkî ne, pîrî caran urf û ‘edet û baweriyên xwe baştir diparêzin ji yên din, ji tradîsyonên devkî. Faktoreke din a ligel êzdiyan bo parastina dînê wan, herêmên wan ên çiyayî bû ku ew tim fêrî jiyana lê bûbûn.

Êzdî piranî li Îraqê dijîn, û her wisa jî li Sûriye, Îran, Turki-

r. 34

yeyê, dewletên Sovyêta berê, piranî li Ermenistan û Gurcistanê jî; pişka bêhtirê êzdiyên li dewletên Sovyêta berê di serê sedsala bîstan de li wir bi cî bûn. Tengasiyên aborî yên dema Sovyêta berê, kir ku hejmareke zêde ya êzdiyên Ermenistan û Gurcistanê koç bikine Rûsyayê. Êzdî niha li Ukraynê jî hene. Gelek êzdiyan koç kirine Ewrûpayê jî, bi taybetî bo Almaniyayê; bi hejmarên kêmîtir li Fransa, Belçîka, Hollanda, Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê, hwd. dijîn.

Bajar û heta welatên cihê yên ku êzdî lê dijîn çiqas dûr bin jî, her êzdiyek bi rast û duristî dizane ka ji kîjan kast û qebîlê ye. Bo her kesê/a ku xwe wekî yek ji civaka êzdî dinase, zanîna nav û dîroka eşîr û babika ku jê ye, îro jî bêhed muhîm e, ji ber ku ev zanîn û zanyarî ciyê yekî di civaka êzdî de diyar dike; herwiha têkiliyên ligel endamên êl û qebîlên din ên êzdî û ligel hinek şexsên ku di jiyana wî/wê ya dînî de muhîm in jî dîsa bi vê zanîn û zanyariyê diyar dibin. Kes, bi vê zanîne berê xwe diyar dike di nav civaka êzdiyan de û wecîbeyên xwe yên dînî bi cî tîne.

Di vê lêkolînê de ez dê struktura sîstema qebîl û êlî vekolîm, ku di vekolîna xwe de ez dê piranî bi civaka êzdiyên Ermenistan, Gurcistan, Rûsya û Ukraynê re mijûl bibim. Hemî agahiyên di vê gotarê de tene pêşkêşkirin, ji materyalên vekolînên min ên qadê ne ku min di van salên dawî de di nav êzdiyên Ermenistan, Gurcistan, Rûsya û Ukraynê de kiribûn. Di vê lêkolînê de girîngiyeke taybet jî li ser vekolîna kêşeya bikaranîna têrmên cihê yên ji bo eşîr û qebîlên êzdî heye, bi taybetî yên li Ermenistan, Gurcistan, Rûsya, ligel hinekên li Îraq, Turkiye û Sûriyeyê.

Di vê lêkolînê de ez hinek agahiyên ku min ji lêkolînên xwe yên li ser çar êlên mezin ên êzdiyan civandî didim, ku ew êl heta serê sedsala berê, di nav axa Împaratoriya Osmanî de dijîyan û piştî bi zor û kutek hatin koçberkirin bo axa Ermenistana

r. 35


îro. Li vir, navên gundên êzdiyên her êlê hatine dayîn, gundên ku dema di nav erdê Împaratoriya Osmanî de bûn tê de dijîyan û piştîre jê koç kirine Ermenistanê û yê heta îro jî lê dijîn.

Ez ê têgehên kast, qebîl û malê rave bikim û herwiha têgeha ‘êl’ê mexsûsen di barê tşkiliya wê tev kategoriya kastê de nîqaş bikim. Paşî, wateyên muhtemel ên navên hinek qebîlan nîqaş dikim û dawî dê berê xwe bidime rolên pênc kesên ku her êzdiyek pê re di nav tşkiliyeke diyar û wezîfeyên muştîrek de ye.

SÎSTEMA KASTÊ

Êzdiyatî ne dînekî mîsyoneriyê ye: Bi tenê ji zayîne mirov dikare bibe endamê civaka êzdî; tevahiya civaka êzdî li ser sîstema kastê ava ye, ku vê sîstemê strûktûreke yekgirtî daye civaka êzdiyê. Hemû êzdî di nav sê kastan de dabeş dibin: Pîr, şêx û mirîd. Pîr û şêx sinifên ruhanî ne, ku êzdiyên Ermenistan û Gurcistanê bi giştî jê re dibêjin “*terîq*” an jî “*ruhanî*”, û ne bi qasî yê din tîrma “*dunav*” jî bi kar tê, lê li cem êzdiyên Îraqê “*dunav*” bêhtir tê bikaranîn. Li gorî çavdêriyên min, wisa xuya ye ku ruhaniyên êzdî (pîr û şêx), nêzîkî 6-7% ê hejmara giştî ya êzdiyan pêk tînin û 93-94%ên mayî mirîd in.

Êzdî nasnavên giştî û cemawerî bi kar tînin ji bo hemû endamên her kastekê. Êzdiyên Sovyêta berê, ji bo tevahiya êzdiyan tîrma *Êzdîxaneyê* bi kar tînin, ji bo tevahiya pîran *Pîranî*, ji bo tevahiya şêxan *Şêxanî* û ji bo tevahiya mirîdan *Mirîdxaneyê* bi kar tînin.



r. 36

QEBÎLÊN ÊZDIYAN

Her kastek ji aliyê gelek qebîlan tê temsîlkirin. Bi nêrîtî, çil ocaxên şêxan û çil yê pîran hene. Lê belê dema min lêkolînên xwe yê qadê dikirin li nav êzdiyên Ermenistan, Gurcistan, Rûsya û Ukraînayê, min nêzîkî 90 navên malên pîran peyda kirin¹.

Ihtimaleke mezin ji ber ku êzdî li herêm û welatên cihê bi cî bûn, û her ku dem borî di encama cudabûna wan de hejmara qebîlan jî zêdetir lêhat. Cudabûn di nav malbatekê de jî çêdibû: Heke çend bira hebûne di malekê de, hingî çend ji wan bûne avakerê *berekê* (jêr qebîl). Bo nimûne, niha, hinek malên pîran hene, wekî pîr Omerxalî û pîr Hesênçînêrî, ku birayên hev bûn (bnr. “Qewlê Omerê Xala”²), an jî pîr Hecî Mihemed³ (bêzuret) û pîr Cerwan, ku ew herdu jî birayên yek bûn. Êzdiyên mala Hesênçînêrî carinan navê mala xwe an wekî “Hesênçînêrî” an jî

¹ Bo navên qederê 200 malên şêx, pîr û mirîdan bnr. kitêba Omarkhalî, Kh. (2005), *Yezidizm. Iz glubiny tysjacheletij*. [Êzdiyatî. Ji kûriyê hezarsalan]. Sankt-Pêtêrsbûrg, rp. 166-175.

² “Qewlê Omerê Xala” bnr. di nav: Rashow, Kh.J. (2004) Pern ji edebê dîne êzidiyan. Dihok. Cild.I, rp. 535-540.

³ Navê ocaxa pîran a Hecî Mehemed “Hecî Mehemed bêzuret” e di nav êzdiyên Ermenistan û Gurcistanê de. Tu zuret û paşketyên ji vê malê nînin li Ermenistan û Gurcistanê, lê belê li Îraqê li herêma Şêxanê hinek êzdiyên ji vê mala Hecî Mehemedê hene.

wekî “Omerxalî” tînin. Lê belê, bi nêrîtî çil babikên pîr û şêxan hene, ku dibêjine malên wan “ocax”.

Têrmên ku ji bo komên patronîmîk (navê bavî) ên êzdiyan têne bikaranîn, dibin binasê hinek tevliheviyan, ku heta radeyekê ji ber pevguherîna têrmên kurdî yên derbarê babik û eşîran de ye. Lê belê, di vir de ez ê hewl bidim ku dîmeneke zelal a bikaranîna rastî ya têrmên cihê yên li ser qebîlên mirîd û malên rûhaniyên êzdî yên di nav êzdiyên Ermenistan, Gurcistan, û Rûsyayê de pêşkêş bikim.

r. 37

TÊRMÊN LI SER MIRÎDAN

Têrmên bi kurdî “*berek*” û “*qebîl*” têne bikaranîn ji aliyê êzdiyên Ermenistan û Gurcistanê ve bi wateya “qebîla mirîdan.” Di dîroka êzdiyan de qebîlên mirîdan ên navdar hene, bo nimûne, Anqosî, Baravî, Dasinî, Mamtacî, Masekî, Memreşî, Mendikî, Mendesorî, Mîrangî, Recefî, Reşî, Rojkî, Sturkî, Şerqî, Şemsika, Xalitî û gelekên din.

Dîroknasê sedsala XVian Şerefexan Bidlîsî, di berhema xwe ya bingehîn a li ser dîroka kurdan “*Şerefname*”yê de (Bidlîsî 1967, Cild 1: 83) navên çend eşîrên êzdî tîne, wekî “Tasnî”, “Xalidî” û “Dûmbûlî.”⁴

Êzdî, vê têrmê di pirsên xwe de wiha bi kar tînin: “Tu çi qebîl î?” (“Tu ji kîjan qebîlê yî?”), “Tu çi berek î?” (“Tu ji kîjan berekê yî?”). Bersivên wan bo nimûne wiha dibin: “Ez Reşî me”, an jî “Ez Dasinî me” û wiha pê de. Lê belê, êzdiyên Îraq, Sûriye û Turkiyeyê di praktîkê de vê têrma “qebîl”ê bi kar naînin.

Êzdiyên Ermenistan û Gurcistanê, têrma “*ber*”ê jî teqeza (kêm caran) wekî hevtayê “berek”ê bi kar tînin. Lê belê ev têrm, bêhtir ji aliyê êzdiyên Ermenistanê ve bi wateyeke din, bi wateya “babik”, “binemal”, yek dikare bibêje bi wateya “jêrbabik”ê tê bi karanîn.

TÊRMÊN KU OCAXÊN PÎR Û ŞÊXAN NÎŞAN DIDIN

Ji bo pênasekirina malên ji kastên rûhanî (pîr û şêxan), têrmên “*mal*” û “*ocax*” têne bikaranîn.

Kasta pîran ji aliyê gelek ocaxan ve tê temsîlkirin, bo nimûne, ocaxên pîr Al, Alûbekir, Bad, Cerwan, Zerza(n), Hacîal,

r. 38

Hesmeman, Îsîbiya, Kemala, Liblan, Memêreşan, Meqlebêz, Memê Şiva(n), Omerxalî, Qedîbilban, Xanîa û hwd.

Dema êzdî dipirsin ka yek ji kîjan ocaxê ye, pirs wiha ye: “Tu çi Pîran î?” (“Tu ji kîjan ocaxa pîran î?”) û bersiv dê bo nimûne wiha be: “Ez Pîrê Îsîbiya me.” (“Ez ji pîrê Îsîbiya me.”) an jî “Ez Omerxalî me.” an jî “Ez pîrê Mem Şivana me.”

Hemû şêx di nav sê malên endogamos de dabeşkirî ne: *Şemsanî*, *Adanî* û *Qatanî*, her yek jê jî di nav malên dîtir de dabeş dibe.

⁴ Şerefexan Bidlîsî, li wê derê navê qebîleyên din jî dibêje: „Basyan“, „Boxtî“ û „Mahmûdî.“

Şemsanî dabeş dibe di nav çar malên mezin de: Şemsedîn, Fexredîn, Nasirdîn û Sicadîn, ku ew çar kurên Êzdînê Mîr in. Ji bilî duyan, Nasirdîn û Sicadîn, ev hemû malên behskirî dîsa dabeş dibin. Bo nimûne, şêxên Şemsedîn (di Qewlan de navê wî texer wekî Şêşims tê telafûzkirin), bi ‘edetî ji aliyê neh kur û sê keçên wî tene temsîlkirin: Şêx Xidirê Şemsa, şêx Evdalê Şemsa, Amadînê Şemsa, Babadînê Şemsa, şêx Hesênê Şemsa, şêx Bavikê Şemsa, şêx Tokilê Şemsa, şêx Avîndê Şemsa, şêx Alê Şemsa, Sitya Îs (Ês), Sitya Nisret, Sitya Bilqan. Ocaxa Şêx Reş (an jî şêx Cinteyyar) ku di nav êzdiyên Ermenistan û Gurcistanê de ye jî ji vê malê ye.⁵

Dema êzdî dixwazin bizanin bê yek ji kîjan ocaxa şêxan e, ew pîrî caran têrmên “mal” an jî “ocax”ê bi kar nayînin, wiha dipirsin: “Tu çi Şêxan î?” (“Tu ji kîjan şêxan î?”). Bersiv dibe ku wiha be bo nimûne: “Ez Şemsanî me, Şêxê Amadîna me”, an jî “Ez Şêxûbekirê me, Şêxê Sorê Sora me”.

Pêdivî ye em vê têrma “ocax”ê (‘kuçk’, ‘mal’, ‘malbat-binemal’) ku di nav civaka êzdiyan de qewî berbelav e rave bikin. Êzdiyên Ermenistan û Gurcistanê ji bo bav û kalan peyva “cîd”ê bi kar tînin. Di nav êzdiyan de meyla hebandina avakerê “ocaxê” heye. Mizargeh û ciyên pîroz hene bi navên şêx û


r. 39

pîran, yên avaker an jî şexsiyetên mezin ên malekê, ku ji aliyê heciyên êzdî ve pîr tene ziyaretkirin li Îraqê.


TÊGEHÊN ‘QEBÎL’ Û ‘ÊL’

Ji bo diyarkirina têgeha ‘qebîl’ê, êzdiyên Îraq û Sûriyeyê têrma “eşîrê” û “îl”ê bi kar tînin. Ji van ya yekem qet û qet nayê bikaranîn di nav êzdiyên Ermenistan, Gurcistan û Rûsyayê de, û ya duyem bi telafûza *êl* û bi wateya “yekitiya qebîlan”, “konfederasyona qebîlan” tê bikaranîn.

Êzdiyên Îraqê, “îl” an jî “eşîrê”yê dabeş dikin di nav “babik” an jî “binemal” an jî “ocax” de:



Êzdiyên Ermenistan, Gurcistan, Rûsya û Ukraynayê, niha têrman wiha bi kar tînin:



⁵ Derbarê malên şêxan de, dabeşbûna wan a di nav sê binemalên mezin û hemû navên malên endamên wan bnr. kitêba Omarkhali, Kh. 2005: 166-168.

Ne berî bi wextekî dirêj, endambûna li êlekê, bêhed muhîm bû bo her êzdiyekê/î, ji ber ku vê yekê hêmintiya wî/wê diyar dikir. Têkildarî vê pendên êzdiyan hene wekî “Qira tev êlê dewat e.” (‘Mirina bi êlê re qasî dewatê xweş e’.) an jî “Êl, maka meryan e.” (‘Êl dayika mirovan e’.)

Ligel endambûna li kastekê, êzdiyên ku îro di nav erdê Ye-

r. 40

kîtiya Sovyetan a Berê de dijîn, endamên yek ji çend êlan in, wate endamên yek ji êlên Zuqirî, Sîpkî, Hesinî⁶, Ortilî, Mehemdî ne. Hêjayî gotinê ye, êzdiyên êla Ortiliyê, ku ji hemî êlan ya herî piçûk e, bi ser êla Hesinî ve têne hisêbkirin.

Balkêş e ku êzdiyên her êlê, dikare bi zaravên xwe ji hev bêne naskirin; bi taybetî, zaravê êzdiyên êlên Hesinî û Mehemdî cuda ye ji yê êlên Zuqirî û Sîpkî. Êzdiyên ji êla Hesinî, gelek caran dewsa “b”yê “v”yê telafûz dikin, bo nimûne, di van peyvên de wiha dibe: Xeber/xever, xirab/xirav, sibe/sive, zebes/zeveş, h’esab/h’esav, xebat/xevat û wiha pê de. Di telafûza kurdiya êzdiyên ji êla Mehemdî, dengê “o”yê berbelav e: “a”yê bi awayê dengdêreke dirêj, nêzîkî “o”yê telafûz dikin.

Endamiya li êlekê, her ligel endamiya qebîl yan ocaxekê, ji bav derbas dibe, ne ji dayikê. Mesela, heke dayik ji êla Sîpka û bav ji Zuqiriya be, zarokên wan (çi keç çi kur) Zuqirî têne hisêbkirin.

Bi kurdî “konfederasyona eşîran a Zuqirî” dibe “Êla Zuqiriya”, û endamiya li wê wiha tê gotin “Ez Zuqirî me”, an jî “Ez ji êla Zuqiriya me”. Lewma dema êzdiyek dibêje “Ez Zuqirî me”, yanî ew ji vê êlê ye.

Heta serê sedsala bîstan, êzdiyên ji eynî êlê, li ser eynî erdê dijiyan û her êlekê serokekî eşîrî hebû -axa; wekî ku li jor behs lê bû, ferqên devokî yên di navbera wan de hêj jî diyar in, û di her êlekê de endamên kastên cihê hene (pîr, şêx û mirîd). Pişka bêhtirê êzdiyên di her êlekê de mirîd in, lê belê pîr û şêx jî lê hene, û mumkun e ku endamên ocaxên wan pîr û şêxan di nav êlên din de jî bin.

ÊLA ZUQIRIYA

Di vê êla ku mirîd û herwiha şêx û pîr tê de hene, qebîlên

r. 41

mirîdan ev in: Beravî (Be’ravî), Bûtîkî, Belekerî, Dasinî (De’sinî), Divinî, Korkitiya, Kurtîkî, Masekî, Çoxreşî, Memreşî, Mendesorî, Mendikî,⁷ Reşî, Reşkî, beşeke Şemsika û yên din; ocaxên pîran ên wekî Omerxalî, Kemalî, Xanî û yên din; û malên şêxan ên wekî Şêx Mend, Şêxisin û wiha pê de hene.

Cî û warên Êla Zuqiriya⁸ li qeza Wanê bûn, li ser deşta bi navê Deşta Ebexê di nav erdê Împaratoriya Osmaniyan de. Erdê di navbera gola Wanê, sînorê Îran û Ava Reşê de, Deşta Ebexê ye. Piraniya xelkê Zuqirî li devera serekaniya Ava Reşê, û sedî heştê li Bêrgiriyê dijiyan ligel

⁶ Li nav erdê Îraqê gundekî êzdiyan ê bi navê Hesinî heye.

⁷ Li başûrê Sincarê li Îraqê, gundekî bi navê Mendikan heye ku li wê derê jî êzdiyên ji vê babîkê dijîn.

⁸ Ji bo agahiyên zêdetir li ser êla Zuqiriya û bi taybetî Cangîr axa binêre kitêba Eskerê Boyîk (ku bi xwe neviyê Ūsib-beğê axayê êzdî yê êla Hesinî ye; dayika wî Gulîzer, keça Ūsib begî bû.) “*Êzdiyatî. Mîrzîkê Zaza. Fermanên reş*”. Oldenburg, 2006, rp. 214-260.

hinek komên li herêmên Arçaq û Tîmaran ku di navbera Gola Wanê û bajarê Serayê⁹ de şênî bûn.

Êzdiyên ji êla Zuqîrî li van gundên qeza Wanê dijiyan, wekî Çibûxlî, Çirax, Dêrcemeda Jêrîn, Dêrcemeda Jorîn, Dîzê, Gîhadîn, Hacelî, Kanîsark, Kose Pişikûmbet, Qijlax, Qelecux, Seyîdabad, Sîmtatos, Şemsedîn, Şenglave, Şivekar, Tîrkêşan, Yarimqa¹⁰, Ûte, Welîcan. Min navên wan gundan dan yê ku bi tenê êzdiyên ji êla Zuqîrî lê dijiyan. Êzdiyên ji êla Zuqîrî ligel êzdiyên ji êlên dîtîr jî dijiyan, her tev ermenî, kurdên misilman ên li gundên wekî Axûrêk, Angûzek, Arçak, Bêgirî, Enzav, Enzel, Gondûrme, Korsot,¹¹ Mûçê, Nanparêz, Xoşab, Xirabe, Tîmar.

r. 42

Ev êl, êleke herî şerûd bû, û tê zanîn ku wan kelehên xwe hebûn, bo nimûne, Kela Xoşebê, Kela Sipî, Kela Reş, Al Kele û yê din ku ji bo parastina ji dagîrkeran ava kiribûn.

Di salên 1916-1917an de, êzdiyên êla Zuqîriya, bi xurtî hatin koçberkirin ji Wanê bo devera Qersê. Li wir, li gundên devera bi navê Devera Çuxurê cî bi cî bûn, ku li wê derê jixwe êzdiyên ji êlên Hesinî û Sîpka hebûn. Ew gund wiha ne: Babxan, Bizirxane, Giyadîn, Omer Beg, Pîr Xala, Saribeglû, Sogitlî, Tûtek, Ûlîkend, Zerîf Xan û yê din.¹²

Di eynî demê de (salên 1916-1917an) Cangîr Axa tev serokekî êla Hesinî Ûsib begî, bi qehremanane şer dikir li dijî tirkan di şerên nêzîkî Qers û Surmeliyê de.

Dema êzdiyên Zuqîrî hatine erdê Ermenistanê, li herêma Aştarakê li Engeserkê (niha nemaye ev gund), li Îlançalanê, Nezîrvanê, Pêrsiyê (ev jî nemaye), û Proşanê bi cî bûn. Li herêma Oktêmbêryanê, li Bambakaşat, Pşatavan, Qamuşlî, û Qulîbegliyê bi cî bûn. Li herêma Abovyanê: Eşerebad (niha ev gund nemaye), Çatqran. Li herêma Talînê, li Keleşbegê, Zîrbeyê (niha navê vî gundî kirine Sorîk).

Serokên navdar ên êla Zuqîriya, Simoyê Çeto û Cangîr axa (Cîhangîr axa) bûn. Cangîr axa kurê Xetîb axa bû û di 1874an de, li gundê Çibûxliya devera Bêgîriyê ji dayik bûbû. Cangîr axa ji qebîla Mendikî ya kasta mirîdan bû, ku ew jî di nav êla Zuqîriya de ye. Roleke pir muhîm bi cî anîbû di şerê Sardarapatê de (Gulan 1918), ku di vî şerê diyarker de ermenan bi alîkariya hêzên wî yê di bin femandariya wî bi xwe de serkeftin bi dest xwe ve anîbû. Ew bû yê ku ligel eskerên xwe êzdî diparastin, û mumkun kir ku ew û ermen rûbarê Eresê biperin di hingama tehcîra wan a bo Ermenistana Rojava de. Cangîr

r. 43

axa di sala 1943an de di girtîxaneyê rûsan de (Saratovê) çû rehma Xwedê.

Cangîr axa kurê Xetîb axayê kurê Cengo¹³ axayê (êzdiyan jê re Midûr axa jî digot) kurê Bişar axa bû. Bişar Axa, alî Mîrzîkê Zaza kir di şerên li dijî tirkan de.

⁹ Li gorî pîr Qanatê Kakê, ku ji êla Zuqîriya ye (di 1940an de li Ermenistanê ji dayik bûye).

¹⁰ Yarimqa ciyê binemala Simoyê Çeto bû.

¹¹ Li gundê Korsotê bi tenê du malên êzdiyên Zuqîrî û nêzîkî 198 malên ermenyan hebûn, ku Cangîr axayê ew di jenosîda di serê sedsala XXan de xilas kiribûn. Paşketiyên ji van ermenyan niha li Kevera (Gavar) Ermenistanê dijîn.

¹² Hemî navên gundên êzdiyan ku xelkê Zuqîrî lê dijiyan di nav erdên Împaratoriya Osmanîyan û Ermenistanê de, ji aliyê pîr Rzayê Kakê ve hatine nivîsandin ku ew bi xwe jî ji êla Zuqîriya ye.

¹³ Cengo kurteyêke navê Cangîr e.



*Heykelê Cangîr axa – serkarê êla Zuquriya
Ermenistan, Yêrêvan. 2006*

Cangîr axa, di 1903/4an de qehremanê neteweyî yê ermenan Andranîk nas kir û di dewata wî de Andranîk bû “*serdewatî*”yê¹⁴ wî. Ew di şerên li dijî tirkên de heta 1918an hevalbend bûn.

r. 44

ÊLA MEHEMDIYA

Di vê êlê de ev qebîlên mirîdan ên wekî Mehemdî, hinekên Memreşa¹⁵ û yê din hene. Ocaxên şêxan ên wekî hemû Şemsanî, hemû Şêx Reş (ji mala Şemsaniya), û Şêxûbekir hene. Ocaxên pîran jî Memê Şivan, Xanî, Qedilbilban û yê din.

Xelkê vê êlê dibêjin ku ew di hingama şerê rûs û tirkên ê sala 1828an de reviyane û di Îranê re koç kirine bo erdê herêma Aparanê,¹⁶ niha li Ermenistanê. Ew cara yekem bû ku ew dihatine ser erdê Ermenistanê. Hingê, gelek şêx û pîrên ji êla Mehemdî ligel wan hatin û li gundê Mîrek ê herêma Aparanê îro bi cî bûn. Ew li herêma Araratê, li gundê Develiyê jî bi cî bûn.

Êzdiyên ji êla Mehemdiya, li deşta Ebexê jî (li Wanê) bi cî bûn, ku dikete rojavayê xelkê Zuqiriya.

¹⁴ Serdewatî ew kes e ku di dewatekê de karûbarên dewatê bi cî tîne.

¹⁵ Piraniya wan dikevîne nav êla Zuqiriya.

¹⁶ Li gorî şêx Rihana Minet, ku ji êla Mehemdî ye (di 1933an de li Ermenistanê ji dayik bûye); û li gorî pîr Rzayê Kakê.

Serokê wan ê navdar Kok axa bû, kurê Mîr Çopan. Li gorî rîwayetan, Mîr Çopan mîrê erdekê bû ku 360 gundên li Deşta Ebexê di bin hukmê wî de bûn.¹⁷

Li gorî rîwayetên êzdiyan, keçeke bedew hebû bi navê Zerîf Xatûn ji mala Mîr Çopan. Rojekê, Zerîf Xatûn ji aliyê kurdekî misilman ve hatibû revandin. Piştî hingî, di navbera êzdiyên ji vê êlê û kurdên misilman de şerek qewimiye, ku êzdî jê re dibêjin “şerê Zerîf Xatûnê”. Di encama vî şerî de 240 xortên ji vê mala êzdî hatine kuştin. Dibêjin ku hemû xort û pîrên mala Mîr Çopan hatibûn kuştin. Lê tenê jineke pêgiran (ducanî) ku ew jî bûka mala Mîr Çopan bûye, xwe xilas kiriye. Ew jin, keça Ûç Gezo (ji qebîla Mem Reşî ya êla Zuqiriya) bûye. Wê kurek aniye dinyayê, navê Kok axa¹⁸ lê kirine, û paşketiyên ji wî, îdame dane vê êlê.

r. 45

ÊLA HESINIYA

Di nav êla Hesiniya de ev qebîlên mirîdan hene wekî Belekerî, Beyandûrî, Bûvkî, Dasinî (De'sinî), Dawidî, Divinî, Dodkî, Gêloyî, Kaşaxî, Mamtacî, Memîdokî, Mexsûdî, Mûskî, Mîrangî, Qazanî, Qûçî, Remoşî, Şerqî, Tûjkî, Ûdî¹⁹ û wiha pê de. Di êla Hesiniya de hinek ocaxên pîran jî hene wekî pîrê Hesmeman, pîrê Omerxalî, û şexan - Şêxûbekir. Endamên hinekên van ocaxan di nav Zuqiriya de jî hene.

Êzdiyên Ermenistan û Gurcistanê dibêjin ku êleke dîtir heye, bi navê êla Ortiliya. Bi dîtina min, ev *êl*, beşeke êla Hesiniya ye. Ortilî komeke babikên ji hemî kastan e. Sehîdê Îbo, di kitêba xwe “Kurdê Rêwî”²⁰ de dinivîse ku li pişt çiyayê Girîdaxê, Araratê, gundê Ortil hebû. Dibe ku ew ciyek bû ku tê de gelek gund hebûn. Xurtî li wan hate kirin ku wê derê biterikînin û ew jî li devera Surmeliyê bi cî bûn. Nivîskarê kitêbê dinivîse ku navê vî xelkê li wê derê dijî, ji navê ciyê Ortilê tê.

Serokê êla Hesiniya, Ûsib begê kurê Hesên begî bû di sedsala XIX-XXan de. Hêjayî gotinê ye, Ûsib begî perwerdeya bala wergirtibû, wî akademî (xwendina bilind) li Êçmîadzinê kuta kiribû. Ew ligel bestekarê navdar ê ermen Komîtas (Sogomonyan) û Keremê Hemîd, kurê begekî kurdê ji binemala navdar a Mala Kose Gulî Cewahir-axa²¹, hîn dibû.

Ûsib begî ne tenê di nav êzdiyan de belkî di nav ermeniyên de jî hurmeteke mezin didît û ji 1918an pê de wekî nûnerekî civaka êzdî hate hîlbijartin bo parlamentoya Komara Ermenistanê. Di hingama destdirêjî û êrîşên tirkan ên ser Komara Ermenistanê de (di 1918an de) û dîsa dema penaberên êzdî dihatine Ermenistanê, wî bi xwe di kar û hewlên bicîkirina wan

r. 46

û dabînkirina tiştên xwarinê û pêdiviyên wan ên dîtir de cî digirt.²²

Êzdiyên ji êlên Hesinî û Sîpka li ser heman erdê dijiyan, piranî li herêma Qersê, lê belê beşeke wan a piçûk jî li herêmên Bazîd û Surmeliyê bi cî bûbûn. (*Navên gundên ku ew lê dijiyan li jêr in*).

¹⁷ Li gorî şêx Rihana Minet.

¹⁸ Li gorî pîr Rzayê Kakê û şêx Rihana Minet.

¹⁹ Li gorî pîr Rzayê Kakê.

²⁰ Sehîdê Îbo (1979). *Kurdê Rêwî*. Yêrêvan, rp. 3.

²¹ Li gorî pîr Qanatê Kakê.

²² Li gorî pîr Rzayê Kakê.

Xelkê Hesiniya îro li Ermenistanê, li herêma Araratê li gundê Afşarê dijîn. Li herêma Aştarakê li Şamîramê; li herêma Oktêmbêryanê li Armavîr, Bedel, Erdeşer, Canfîdan, Melebedir, Qurûerez, Şariyar, Ûzûnov û li yên din dijiyan. Li herêma Artaşatê li ciyên wekî Arêvşat û Ayntabê (îro Tezegyûx) dijiyan. Li herêma Êçmîadzinê êzdî li E'ynelî, Eyarlî, Qiziltemûr (îro navê wê kirine Aragats), Tsaxkûnk û Zvartnotsê dijiyan. Li herêma Abovyanê li Arînc, Cêrvêj, Gundê E'mo, Mûretepe



*Heykelê mezelê Üsib begê
Ermenistan - Şamîram, 2006*

r. 47

û Qereqelê dijîn. Li herêma Talinê: Aragats, Beroj, Gelto, Gêtap, Heko, Karakêrt, Sabûncî, Tilik û Qijla Me'ra. Li herêma Masisê li Masîsê dijîn û dijiyan²³.

ÊLA SÎPKA

Di nav êla Sîpka de ev qebîlên mirîdan hene wekî Belî, Çilî, Îsedizî, Kaşaxa, Karêyî, Kilêrî, Mixayla, Pîvazî, Recevî (Recefî), Rojkî, Sahaniya, Stûrkî, Şanezera, Şemsika, Utî û wiha pê de. Wekî ocaxên pîran, pîrê Bad, pîrê Qedîbilban, pîrê Memê Şivan û yên din hene û wekî şêxên wan, şêxên ji malên Şemsanî û Şêxûbekirê (Qatanî) ne.

Êla Sîpka dabeş bûbû du koman, û serokê komekê Emer axa bû. Ew pîranî li devera Dîgora li herêma Qersê dijiyan. Dîgora Jêrîn û Dîgora Jorîn hebûn. Êzdiyan ji vê devera Dîgorê ya êzdînişîn re digotin, “Xerebe Dîgor”. Serokên koma din, ku li gundên newala Sînekê²⁴ û derûdorên wê dijiyan, du kurên Polat beg, Elî axa û Egît axa,²⁵ bûn.

²³ Li gorî pîr Rzayê Kakê û pîr Qanatê Kakê.

²⁴ Sînek ku bi kurdî wekî “Çolê Sînekê” jî tê binavkirin, newal e.

²⁵ Li gorî pîr Rzayê Kakê.

Li gorî êzdiyan, pêşiyên êzdiyên êla Sîpka yên ku li herêma Sînekê dijiyan û serokên wan, kurên Polat beg bûn, ji herêma Musilê hatibûn “di dema Xezaliyê de.”²⁶

Hinek êzdiyan hîna jî gotinên dê û bavên wan li bîr tî, ku daybavên wan serhatiyên li ser rabirdûya wan a dilsoj lê qehremanî digotin ji wan re. Agahderekî min (Pîr Rizayê Kakê) li bîr tê ku dayika wî, ku her ji wê êlê bû, jê re dîroka êla Sîpka kat dikir. Wê çîroka hatina êzdiyên Sîpka bo erdê Ermenistanê, kite bi kite jê re digot.

r. 48

Beşeke êzdiyên ji êla Sîpka, di 1854-1856an de, di hingama şerê Rûsya û Osmaniyan de hatine erdê Ermenistana Rojhilat û piranî li herêma Aparana îro, ku hingê di nav Rûsyaya Tsarî de bû, bi cî bûne. Beşeke din a êzdiyên êla Sîpka di 1877-1878an de di hingama şerê rûs û turkan de hatine. Beşeke mezin a dîtir ji êzdiyên Sîpka jî, di hingama Şerê Cîhanê yê Yekem de hatine van deveran. Lê belê, li gorî hinek rîwayetên êzdiyên vê êlê, hinek malên êzdiyan hê ji salên 1827-1828an ve li erdên Ermenistana Rojhilat (li herêmên Aparana îro) dijiyan.²⁷

Êzdiyên ji êlên Sîpka û Hesiniya, li heman herêmê dijiyan, piranî li herêma Qersê, lê li deverên Bazîd û Surmeliyê jî ji wan hebûn. Li van gundan dijiyan wekî Akarak, Alem, Emençayîr, Emenkoy, Êngûk, Ênîkêy, E’slaniyê²⁸ (li Surmeliyê), Eylâ Sinco, Esmer (li Bazîdê), Bacelî, Bazarcux, Bandemûrad, Badilî, Dîgora Êzdiya, Diyadîn (li Bazîdê), Dêrîk, Dîmsiz, Dûzgeçî (li Surmeliyê), Dutax (li Bazîdê), Gogermes, Gundê Kelo, Germeşiv, Gundê Mexso, Gundê Şêxa, Hoce Qiclax, H’esencano, Kundo, Kûçe (li Surmeliyê), Kose Sogitlî, Qerelix, Qezîkoplân (li Surmeliyê), Qizilqul, Qizildiz (li Bazîdê), Qiznefer (li Surmeliyê), Qerekoz, Qereqela Jor (Qereqela Baro), Qereqela Jêr, Qerekend, Qulp (li Surmeliyê), Qubik, Qizilce, Tendûrek, Tawşan, Taşnîka Êzdiya (Taşnîka Çoxreşa), Taşnîka Kurda, Taşkorpî, Xuxan (li Bazîdê), Mala Şemdîn (li Bazîdê), Remenqulî, Sarîblax, Sîçan, Sorixlî, Sînek, Sûsiz, Şatiroxlî, Şîrînkû²⁹.

r. 49

Devera Çuxurê ew dever e li herêma Qersê ku gundên Sipkî û Hesiniyan lê bûn û di 1917an de êzdiyên ji êla Zuquriya hatinê û piranî li van gundên wekî Bizirxane, Giyadîn, Pîr Xala, Babxan, Omer Beg, Sogitlî, Tûtek, Ûlîkend, Sarîbeglû, Zerîf Xanê bi cî bûn.

Dema êzdiyên ji êla Sîpka hatine erdê Ermenistanê, li van gundên herêma Aparanê bi cî bûn wekî Çobanmaz, Camûşvan (Camûşvana Biçûk), Elegez (Camûşvana Mezin), Gozeldere, Poşt, Pamp, Cercerîs³⁰ (niha Dêrîk), Korbilax, Mîreka Jorîn (piraniya êzdiyên wê derê ji êla

²⁶ “Xezaliyê” wextekî ne diyar e, bi ihtimaleke mezin e ku qesta wê dema qetlên mezin, zulm û revîna, wekî êzdî dibêjin, ji herêma Musilê dîke.

²⁷ Li gorî pîr Rzayê Kakê, ku qisetên dayika wî Gulîzera Memed (jidayikbûn 1916) têne bîra wî, û ku dayika wî jê re qiset dikiriye ku bapîregewrê wî li gundê Pampa (îro Sîpan) herêma Aparanskiya îro hatine dinyayê. Babê bapîregewrê wî hatibûye vê herêmê.

²⁸ Eslaniyê gundê Hesên axayê bavê Ûsib begî, serokê êla Hesiniya bû.

²⁹ Li gorî pîr Rzayê Kakê. Ji bo agahiyên zêdetir li ser erdê ku êzdî li Împaratoriya Osmaniyan lê dijiyan binêre: Keremê Anqosî. (2004), *Êl û berekêd kurdêd-êzdî li Qavqaza başûr û Almaniyayê*. Tibilîsî, rp. 46-52; Wezîrê Eşo (Rashidov V.A.). (1989), *Casimê Celîl. Bijare*. Yêrevan, rp. 4; xebatên Erebe Şemo, Heciye Cindî. Di van kitêban de yek dikare zêdetir navên gundên êzdiyan li nav erdê Împaratoriya Osmaniyan peyda bike; min bi tenê navên gundan dan yên ku agahderên êzdî dikaribûn bi bîr bînin û bi xwe ji min re bibêjin.

³⁰ Heyamekê Cangîr axa li vî gundî jiya piştî salên 1918-1919an.

Mehemdî ne), Mîreka Jêrîn, Senger, Quruboxaz, Qundesaz. Ew li herêma Êçmîadzinê jî li gundên wekî Koranlê, Korpelî, Kûrekend, Bagramiyan, Norakêrt û yên din dijiyan û dijîn. Li herêma Talînê, li gundên Artênî, Baysiz, Sîçenlî, Qibixtepeyê dijîn.

Di salên 1920î de, ji ber muşkuleyên aborî û hejmara zêde ya penaberan li Ermenistanê, hinek êzdî çûne Gurcistanê û li wir bi cî bûn. Ew li wir bi cî bûn û niha li bajarên wekî Tbilisiyê, ku qederê 70%yê êzdiyên Gurcistanê lê dijîn, Batûmî, Rûstavî, Kûtaîsî, Têlavî, Gardabanî, Kobûlêti û li bajar û deverên din dijîn.

EŞÎRÊN ÊZDIYAN LI ÎRAQÊ

Gelek eşîrên êzdî hene li nav erdên Îraq, Turkiye û Sûriyeyê ku gelek ji wan eşîran nayên zanîn di nav êzdiyên Ermenistan, Gurcistan û Rûsyayê de.

Balkêş e ku êlên êzdî yên Ermenistan û Gurcistanê (Zuqîrî,

r. 50

Sîpkî, Hesînî û Mehemdî) wekî êl nayên zanîn di nav êzdiyên Îraq, Turkiye û Sûriyeyê de.

Agahiyên derheqê eşîrên êzdî yên li Îraqê de, ji hevpeyvînên ligel êzdiyên ji Îraqê hatine berhevkirin ku niha her yek li welatekî cihê yê Ewrûpayê dijî; herwiha di kitêbên C.J. Edmonds³¹ û X.C. Raşo³² de jî agahî hene derheqê eşîrên êzdiyan yên Îraqê de.

Bereksê êzdiyên Ermenistanê, eşîrên êzdiyan ên li Kurdistana Îraqê bi gelek nêzîkî têkildarî erdê îkameta eşîrê ne. Êzdiyên Îraqê dabeş bûne di nav du komên mezin de: Şêxanî û Şingalî (Şingarî). Êzdiyên Şingalî jî di nav xwe de dibin du kom: Cuwana û Xorkanî ku ji çend eşîran pêk tê.

Li Şêxanê ev eşîrên êzdiyan hene wekî Belesînî, Basidkî, Dina, Dumilî³³, Hekarî, Heraqî, Mamûsî, Misûsanî, Pêdayî, Qa'îdî, Qirnayî, Rûbaniştî, Tirk, Xalitî, Xetarî û yên din.

Koma êzdiyên Şingalî van eşîrên hanê dihewîne: Aqoşî, Bekira, Çûkan, Dilkan, E'meran, Hebaban (Hebabat), Howêrî, Hilêqî, Heskan (bakurî), Kizan, Korkorkî, Mala Xalitê (Miskora, Qîçikan, Hesenî, Nukrî, 'Eldinan, Usivan, Xoşî, 'Elî Sorka, Xifşan), Masekî, Mihirkan (Mehirkan), Xinan û yên din.

Koma êzdiyên Şingalî van eşîrên hanê dihewîne: Aldexî, Adiyân, Aldîn, Bekran, Cefrî (Cefriyan), Çêlka, Çêlkan, Dilkan, Heskan (başûrî), Hewîrî, Helîqî (Heleyqî), Kurkurka (Korkorka), Mendikan, Mûsanî, Mehirkan, Musqora, Mala Bakê, Qîçkan, Qîranî, Reşkan, Simûqî (Semoqa), Şirqan, Şerqiyân, Şehwanî û yên din.

r. 51

NAVÊN QEBÎL Ê OCAXAN: WATE Ê ASSOSIASYONÊN WAN

Niha em berê xwe bidine aloziyên navên babikên êzdî – bo nimûne qebîla mirîdan a Xalitî, ku Şerefxan Bidlîsî jî behs lê kiribû. Li Îraqê, ev eşîr dabeş bûye di nav heft babikan de:

³¹ Edmonds C.J. *A pilgrimage to Lalish*. The Royal Asiatic Society of Great Britain and Ireland. 1967.

³² Rashow Kh.J. *An approach to the essence of Yezidian Religion*. Uppsala, 1998. (Bi Erebi.)

³³ Şerefxan Bidlîsî ne carekê dinivîse derbarê vê êlê de di “*Şerefname*”yê de. Ew dinivîse ku mîrên ewil ên eşîra Dumbulî, çûne ser dînekî “mezebeke adî yê êzdiyan (Bidlîsî 1967: 357).

Zirganî, Sirucî, Xendeqî, û hwd.³⁴ Qebîleke mirîdan heye bi navê Xalitî di nav êzdiyên Ermenistan û Gurcistanê de, ku ev babik wekî di mînaka êzdiyên Îraqê de dabeş nebûye di nav jêr-babikan de.

Ligel ku piraniya eşîrên êzdî, navên xwe ji navên pêşî (cid) an pêşengên xwe digirin, navên hinekan jî tev navê cografî girêdayîne. Bo nimûne, qebîleke mirîdan heye bi navê Kendalî, û bi heman navî gundek jî heye dikeve başûrê Êsivniyê li herêma Şêxanê li Kurdistana Îraqê. Dîsa qebîleke mirîdan bi navê Memreşî û gundekî bi heman navî heye li başûrê Êsivniyê (ev gund jî di navbera Êsivnî û gundê Kendalî de ye li herêma Şêxanê). Babikeke mirîdan heye bi navê Mûskî û dîsa gundê Mûseka heye li nêzîkî çiyayê pîroz ê Meqlûbê (li herêma Şêxanê li Kurdistana Îraqê). Mirîdên vê qebîlê li Ermenistan, Gurcistan û Rûsyayê, û herwiha li herêma Sîncarê jî (Şingal) di nav xelkê Cuwana de hene. Dema ji herêma Qersê, ji gundê Zorê û Bazîde bar kirin hingî xuya bûn li Ermenistanê³⁵.

Hinek ocaxên pîr û şêxan têkildarî diyardeyên siruştî ne. Bo nimûne, pîr Afat, bi lêser û tergê (teyrok) re tê têkildarkirin. Hejmareke ocaxên pîr û şêxan jî hene ku li gorî baweriyê têkiliya wan bi bayî re heye, lewre ba yek ji elementên sereke ye: Şêx Hesên (Şêxîsin), Şêx Mûsê Sor, pîr Bad (an jî carinan Bat). Memê Reşan, ku nasnavê wî “şêr” bû, hakîmê baranê û piştevanê ekinan e.

r. 52

Hinek ocaxên pîr û şêxan mexsûs bi hinek heywanan re têne têkildarkirin. Bo nimûne, bawerî ew e ku Şêx Mend piştovanê meran e, an jî Şêx Zendîn piştovanê kêvroşkan e, Şêx Sicadîn ye mişkan û wiha pê de. Bo nimûne, bawerî wisa ye ku ocaxên pîran ên wekî Cerwan piştevanên dupişkan in.

Hinek ocaxên pîr û şêxan jî bi hinek nexweşîya ve têne têkildarkirin, meselen, ew dikarin alî saxkirina nexweşiyê bikin. Bo nimûne, şêx Cinteyyar, pîr Qedîbilban û pîr Hacıyal dikarin mirovên bi nexweşîya mêjî baş bikin. Şêx Amadîn dikare zikêşîya zarokan pak bike (sancû birîn), û wiha pê de.

Hinek navên ocaxên pîran ji navên piştevanên êzdî ne. Bo nimûne, pîr Memê Şivan ji navê Memê Şivanê – Xudanê pezî tê. Pîr Gavanê Zerzan jî dîsa navê xwe ji Gavanê Zerzanê girtiye ku Xudanê heywanê mezin (pêrû) e.

Mala pîrê Libnan alîkariya mirovên zewicî dike (û kê dixwaze bizewice). Di cejna mezin a Xidir Nebî û Xidir Elyas de, êzdiyên evîndar ji bo dawet û bextiyariya xwe niyaz dikin ji Xidir Nebî û ji Libnan. Dibêjin ku Libnan gelek cîwarên hecê ava kirin û ji ber vê hindê nasnavê wî “pîrê pirîketan” e.

Di nav êzdiyan de li ser navên babikan jî şîroveyên cihê hene. Texer, biyografiya şexsê dîrokî, yanî avakerê babikê bi efsaneyan tê mezinkirin. Carinan ev yek ji etîmolojiya amiyane pêk tê. Ez dê li vir behsa yek ji wan bikim derbarê maleke pîran de, wate Omerxala. Êzdiyên Ermenistanê, ligel gelek çîrokên cihê, çîrokên etîmolojiya neteweyî gotin ji min re derbarê eslê vî navî de: Li ser rûyê avakerê vê ocaxê, Omer, xalek hebûye, ji ber vê hindê ye ku navê Omerê Xala lê hatibû kirin. Lê belê, ew ji mala xwe re texer (piranî) dibêjin ‘Mala Bava’.

³⁴ Li gorî Dr. X.C. Raşo.

³⁵ Li gorî pîr Wezîrê Kakê.

Ocaxên pîran ên bi navê Hesmeman jî hene, lê belê di nav êzdiyan de ew wekî “pîrê çil pîra” têne nasîn, ji ber ku ew wekî Pîrên (bnr. li jêrî) 40 ocaxên din ên pîran in.

Bi vekolîna lîteratûr û çavkaniyên dîroknivîsiyê yên wekî

r. 53

wakayînameyan, yek dikare bibîne ku navê her malekê tiştinan dibêje derbarê dîrok û eslê wê de. Jê pê ve, hejmareke navên babikên êzdiyan hene ku eynî ew nav di nav kurdên ji dînen misilman û Ehl-î Heq de jî hene. Bo nimûne, eşîreke êzdiyan heye bi navê Dumilî û herwiha kurdên Ehl-î Heq hene ku ji eynî eşîrê (Dimilî) ne. Jê pê ve, qebîleke mirîdan heye bi navê Şikakî û herwiha eşîreke navdar a kurdên misilman jî heye dîsa bi eynî navî.

Gelek mînakên vê yekê hene ku eşîreke kurdan hem êzdiyatîyê, hem jî îslam qebûl kiribin.³⁶ Wekî ku li jor behs lê bû, yek bi zikmakî dibe êzdî, yek nikare vî dînî helbigire, piştî qebûl bike; jê pê ve, divê daybav herdu jî êzdiyên ji kast û babikên ku zewaca di navbera wan de durust e bin. Ev yek dikare wisa bê şîrovekirin ku ev eşîrên kurdan, berî belavbûna îslamê êzdî bûne.

Li Kurdistana Îraqê, êzdî li Duhok, Zaxo û dorûberên wan dijîn, û jê muhîmtir, li du herêmên muhîm, Şingal (Sincar) û Şêxanê. Êzdiyên Îraqê texer navên giştî bi kar tînin ji bo diyarkirina eslê êzdiyan: Welatşêxî û Şingalî.

Êzdiyên Sincarê (Şingal) di nav xwe de dabeş dibine du komên mezin: Cuwana û Xorkanî. Lê belê ew wekî eşîr nayên hisêbê; ev navkirinên deverî ne. Êzdiyên bakurê Sincarê, Cuwana ne, û yên başûr Xorkanî ne. Her yekê van koman jî dabeş dibe çend eşîran û ew jî, dîsa di nav xwe de dibin çend babik an jî berek.

PÊNC FERZ

Xaleke din a gelekî muhîm heye bê ka çima zanîna kast, eşîr û babikan bo her êzdî bêhed girîng e, emr, zayend, kast û îka-

r. 54

met çî dibe bila bibe. Bo her êzdîyek bêhed muhîm e bizanin bê ka ji kîjan kast û babikê ne, û mirov dikare bibêje niha di sedsala XXI de, hê zêdetir muhîm e ji ber ku her êzdiyek, çî ji sinifa rûhanî çî ji mirîdan, divê pênc ferzan (niha jî gelek caran tenê sê) bi cî bîne. Bi xêra ferzan, ku hemû peyrewên dîne êzdiyatîyê yek dike û digihîne hev, strûktûra tekane ya civaka êzdî pêk hatiye.


Esasê van *pênc ferzan* ew e ku divê her êzdiyek Pîr, Şêx, Hosta (hostayê rûhanî), Merebî (mamostayê rûhanî) û Birê Axiretê û/an jî Xuşka Axiretê hebin ligel wezîfeyên wan ên diyar. Yanî divê her êzdiyê di vê dinyayê de ev pênc kes hebin, ku têkiliyên wan ên manewî ligel wî/wê êzdiyî/ê diyar û zelal in. Jê pê ve, divê ew îlahî û qanûnên êzdiyatîyê fêrî wî/wê bikin, pê bidin zanîn ka çawa hereket bike di nav civaka êzdiyan de. Lê ji hemiyana muhîmtir, divê ew, merasîmên sebarê bi merhaleyên sereke di jiyana êzdiyekî/ê de (merasîma înitiationê (bo nimûne: *Bisk birîn*; *mor kirin*, û hwd.) merasîma cenazeyê (teslîmê erdê kirin yan çalkirin), û

³⁶ Ji bo navên eşîrên kurd binêre kitêba Lerxh, P. (1856). *Issledoaniya ob iranskikh kurdakh i ikh predkakh severnykh khaldeyakh*. Book I. Sankt-Pêtêrsbûrg.

hwd.) bi rê ve bibe û beşdariyê lê bike.

Demê min hevpeyvîn çêdikin tev êzdiyên Ermenistanê di 2005an de, gelek êzdiyan bo pirsê “Bi ya we sîstema kastê divê bi eynî awayî dewam bibe an na?”, bersiva “Erê” dan. Delîlê esas ku êzdî nikarin bêyî sîstema kastê bijîn, hebûna pênc ferzan e, ku bêyî sîstema kastê ew pênc ferz bi cî nayên.


Hemû endamên kastan divê wezîfeyên xwe bi cî bin: Pîr, divê bibe Pîrê “mirîdên” xwe; şêx, divê bibe Şêxê “mirîdên” xwe. Êzdiyên Ermenistanê navkirinên li jêr bi kar tînin bo wecîbeyên endamên her kastekê:



r. 55

Yanî erka Pîr, “Pîrtî kirin” e, ya Şêx, “Şêxtî kirin” e. Jê pê ve, dîsa *pênc ferz* qedexeyên li ser zewacên êzdiyan diyar dike ne tenê di navbera kastan de belkî di zewacên navbera hinek malên heman kastê de jî.

Erkên sereke yê Merebî û Hostayan, fêrkirina edebiyata dînî ya êzdiyan, îlahî û qanûnên wan in. Di nav êzdiyên Ermenistanê de, Şêx, Pîr, Birê Axretê û yê din tenê dikare ji wê malê bin ya ku ew êzdî dikare jê hilibijêre, bo nimûne, şêxekî mala xwe³⁷. Meselen, Şêxên pîrên Omerxaliya, şêxên ji mala Şêx Mend in (ew ji mala Fexredîn in, ku ew jî di nav binemala Şemsanî de ye). Û ew nikarin vê qaîdeyê biguherin, yanî rabin û Şêxekî ji maleke dîtir hilibijêrin. Pîrê çil malên pîran, pîrên ji ocaxa Hesmeman in (pîrê çil pîra), lewre zewacên di navbera van ocaxan de qedexe ne.



³⁷ Ji bo agahiyên zêdetir li ser têkiliyên “pênc ferzan” û li ser eşîrên êzdiyên Îraqî bnr. di nav: Kh.J. Rashow (1998).

Her êzdiyek divê Şedetîya Dîn (an jî Şehda Dîn) bizane, ku di wê şedetiyê de hinek rêz hene ku divê êzdî navên hemû malên mirovên ji *pênc ferzên* xwe bîne.

ENCAM

Babikên êzdî nebûne malê zemanên berê, lê berevajî vê, ni-

r. 56

ha jî li kar in û ciyê êzdiyek di nav civakê de bi awayekî zelal û teqez diyar dikin. Civaka êzdiyan ne tenê sîstemeke têkel e, ku bingeha wê dabeşbûneke li gorî kast û dînê ye, belkî sîstemek e ku li ser pênc ferzan ava ye: Û di bingeha hemîyan de zanîna eşîrên êzdiyan heye.

ÎLAWÊ: LÎSTEYA QEBÎL Û OCAXÊN ÊZDIYAN

Şêxanî: Adanî, Qatanî, Şemsanî

Pîranî

Mirîdxane

ŞÊXANÎ

I. ADANÎ

Şêxisin / Şêx Hesên

Şêx Şerfeddîn

Şêx Zêndîn

Şêx Brahîmê Xetimî

Şêx Mûsê Sor

Şêxê Êtîma

Sitya Gul

II. QATANÎ

Şêxûbekir / Şêx Abû Bekir

Şêx Mehmedê Batinî

Şêx Îsmâîlê E'nzeli

Şêx Ebdilqadir

Şêx Maviyê Zar

Şêx Kara

r. 57

Şêx Xelîfeta

Şêx Sorê Sora

III. ŞEMSANÎ

1. Şêşims / Şêx Şems êd-Dîn
2. Fexredîn / Fexr êd-Dîn
3. Sicadîn / Sica êd-Dîn
4. Nasirdîn / Nasr êd-Dîn

1. Şêşims / Şêx Şems êd-Dîn

Şêx Xidirê Şemsa
Şêx E'vdalê Şemsa
Amadînê Şemsa
Babadînê Şemsa
Şêx Hesênê Şemsa
Şêx Bavikê Şemsa
Şêx Tokilê Şemsa
Şêx Avîndê Şemsa
Şêx Alê Şemsa
Şêxê Reş / Şêxê Cinteyyar
Sitya Îs / Ês
Sitya Nisret
Sitya Bilxan/Belqan

2. Fexredîn / Fexr êd-Dîn

Şêx Mendê Fexra
Xatûna Fexra
Şêx Bedir

r. 58

3. Sicadîn / Sica êd-Dîn

—

4. Nasirdîn / Nasr êd-Dîn

—

PÎRANÎ

Al
Alûbekir / Alobekir
Afa
Atqatê

Axa
Bad / Bat
Bazîd
Be' rî
Beybûn
Biwal
Bû
Bûb / Bob
Bûk
Boz / Bûz
Cervan / Cerwan / Cebran / Cerva
Çak
Çêlê
Davûdî / Daudîbiderman
Deva
Dirbês / Derbis
Delî
E'vdîa
Êzîd
Fat
Gavanê Zerzan
Gerger

r. 59

Hacxal
Hemel
Hesmeman / Hesên Meman / Pîrê çîl pîra
Hecî Mehemed bêzuret
Hecî E' lî / Hecî E' lî Memîn
Hesen
Hesençînarî / Hesençînêrî
Hesen Deqîq
Hesençîkêr
Hesen Te' lk
Hesîn Pîr
Hesînşîrin
Hesnenak / Heslemek / Heslenak
Hacîal
Hesnalka / Hesên Êlka
Hemedê Babê
Hêsîm
Hû
Îs
Îsîbîa / Êsîbîya
Kewkî
Kemala

Liblan / Libna / Libina

Lûfî

Memêreşan / Mehmedê Reşan

Meqlebêz / Melqebêz

Memê Şivan

Mala Bala

Mehbûf / Mebûb

Mus / Mosê

Mehmedê Reben

Men

r. 60

Mend

Mervan / Merwan

Mehmûd

Mehed Yeşan

Meysûr

Mensûr

Momin

Navdar

Omerxalî / Omerê Xala

Qedîbilban

Qerecer

Qelender

Qilêç

Reşîd Mêravê

Reşê Heyran

Sibatê / Siba

Sînexalî

Sînanezar

Sinîbalê / Sinîberî

Şamîa

Şalyar

Terciman

Tûz

Tûskî

Xemsî

Xanîa

Xefûf

Xoşava / Xoş Afa

Xetîpisî / Xetî Bisî

Zekir / Zikir

r. 61

MIRÎDXANE

Anqosî
Baravî / Be' ravî
Belî / Bela
Belekerî
Beyandûrî
Bûdî
Bûtîkî
Bûvikî
Celay
Çoxreşî / Çoreşî
Çîlî
Çildergûşî
De' sinî
Divinî
Dodkî
Gabelekî
Gerdenzerî
Gêloyî
Îsediza
Kendalî
Korkotî
Kurtîkî
Kaşaxa
Kilêrî
Mamoyî
Mamtaçî
Masekî
Memeşerîf
Memreşî
Memîkî

r. 62

Memîdokî / Memûdokî
Mendîkî
Mendesorî
Meksûdî
Mihemdî / Mehemdî
Mihêlî
Mixaîlî
Mîrangî
Mûsêsanî
Mûskî
Ozmansûyî / Ozmansoy
Pîvazî

Qerêyî
Qûçî
Qazanî
Reşî
Reşikî
Recefî / Recevî
Remoşî
Reşkot
Rojkî
Sturkî
Sahanî
Selwanî
Şikakî
Şerqî
Şemsika
Şemezerîn
Şahnezerî
Tûjkî
Torinî
Ûdî

r. 63

Ûtî / Witî
Xalitî
Weloy
Yeknava

EŞÎRÊN ÊZDIYAN LI ŞINGALÊ

1. Xorkan

Aldexî / Aldexî
Adiyan
Aldîn
Bekran
Cefrî / Cefriyan
Çêlka
Çêlkan
Dilkan
Heskan – şerqan
Hewîrî
Helîqî / Heleyqî
Kurkurka / Korkorka
Mendikan
Mûsanî

Mehirkan
Musqora
Mala Bakê
Qîçkan
Qîranî
Reşkan
Simûqî / Semoqa
Şirqan
Şerqiyan

r. 64

Şehwanî

2. Cuwana

Aqoşî
Bekira
Çûkan
Dilkan
E'meran
Hebaban / Hebabat
Howêrî
Hilêqî
Heskan – şimal
Kizan
Korkorkî
Masekî
Mihirkan / Mehirkan
Xinan

Mala Xalitê



Miskora
Qîçikan
Hesenî
Nukrî
'Eldinan
Usivan
Xoşî
'Elî Sorka
Xifşan

r. 65

EŞÎRÊN ÊZDIYAN LI ŞÊXANÊ

Belesinî
Basidkî
Birîmenî
Dina
Dumilî
Hekarî
Heraqî
Mamûsî
Misûsanî
Pêdayî
Qaidî
Qirnayî
Rûbaniştî
Tirk
Xalitî
Xetarî

BÎBLİYOGRAFYA

- BIDLÎSÎ, ŞEREFXAN IBN ŞEMSEDDÎN. 1967: *Şeref-namê*. Ji aliyê E.I. Vasiljeva ve hatiye wergerandin bo rûsiyê. Moskva, PPV, Cild. I. (bi rûsî)
- EDMONDS, C.J. 1967: *A pilgrimage to Lalish*. The Royal Asiatic Society of Great Britain and Ireland. (bi inglîzî)
- OMARKHALI, KH. 2005: *Yezidizm. Iz glubiny tysjacheletij*. [Êzdiyatî. Ji kûriyê hezarsalan]. Sankt-Pêtêrsbûrg. (bi rûsî)
- RASHOW, KH.J. 2004: *Pern ji edebê dînê êzdiyan*. Duhok. Cild. I-II. (bi kurdî: kurmancî bi tîpên erebî)
- RASHOW, KH.J. 1998: *An approach to the essence of Yezidian Religion*. Uppsala. (bi erebî)